



2. Uluslararası Ahmed-i Hânî Sempozyumu “İslam Düşüncesinde İnsan” 28-30 Eylül 2018



Bildiriler Kitabı
Proceedings Book

AĞRI
İBRAHİM ÇEÇEN
ÜNİVERSİTESİ
2007

Tesîra Ehmedê Xanî
li Ser Edebiyata Kurdî ya Modern
(Ahmed-i Hânî'nin Modern Kürt Edebiyatına Etkisi)

Arş. Gör. İlyas SUVAĞCI

Siirt Üniversitesi

Özet

Ahmed-i Hani; *Mem û Zîn*, *Nûbara Biçûkan* ve *Eqîda İmanê* gibi eserleriyle Klasik Kürt edebiyatının doruğa ulaştığı 17. yüzyılın en büyük şairidir. Hani, öncüleri olan; Şeyh Ahmed Cezerî, Feziyê Teyran, Melayê Bateyî gibi şair ve ulemânın dînî ve edebî geleneğinin takipçisi olarak halkının, dinini, dilini ve kültürünü daha iyi öğrenmesi için eserlerini oluşturmuştur. Memê Alan destanını yeniden ele alıp oluşturduğu *Mem û Zîn* adlı aşk mesnevisinde Mem ile Zîn adlı âşıkların trajik hikâyelerini anlatmıştır. Hani, medreselerdeki Kürt çocuklarının dinlerini daha iyi öğrenmeleri için manzum bir sözlük olan *Nûbara Biçûkan* adlı eserini yazar. Arapça ve Kürtçe olan bu sözlük Kürt çocuk edebiyatına ait ilk eserdir. *Eqîda İmanê* adlı eserinde ise İslâm'ın temellerinden bahseder. Osmanlılar ve Safeviler arasında süren savaşların yıkıcı etkisi Hani'yi de derinden sarsmıştır. Kimi araştırmacılar, Hani'nin yıllarca süren savaşlardan derinden etkilenen Kürtlerle ilgili *Mem û Zîn*'de dile getirdiği düşüncelerini, erken dönem milliyetçiliğini yansıttığı şeklinde yorumlamışlardır. Bu durum eserin edebî değerini geri plana itmiş, onun salt milliyetçilikle yorumlanmasına neden olmuştur. Bizler de bu çalışmamızda Ahmed-i Hani'nin modern Kürt edebiyatını nasıl etkilediğinden bahsedip Hani'nin ve *Mem û Zîn*'in bilhassa modern Kürt şairlerinin şiirlerinde hangi bağlamda ele alındığını, onların Hani'nin fikirlerinden ve eserlerinden nasıl etkilendiklerini inceleyeceğiz.

Anahtar Kavramlar: Ahmed-i Hani, Mem û Zîn, Şiir, Modern Kürt Edebiyatı, Etkilenme.

The Impact of Ahmad-i Hani on Modern Kurdish Literature

Abstract

Ahmad-i Hani is one of the greatest poets of the 17th century reached by the classical Kurdish literature with works such as *Mem û Zîn*, *Nûbara Biçûkan* and *Eqîda Imanê*. Hani is the follower of the religious and literary tradition of the poet and the ulama such as Sheikh Ahmed Cezari, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî. He created his works for his people to learn more about their religion, language and culture. He re-invented Memê Alan's epic and described the tragic stories of lovers named Mem and Zîn in the love masnavi called *Mem û Zîn*. Hani writes the *Nûbara Biçûkan*, a verse dictionary for the Kurdish children in the madrasah, to learn their religion better. This dictionary which is in Arabic and Kurdish, is the first work of Kurdish children's literature. He mentions the foundations of Islam in the *Eqîda Imanê*. The devastating effect of the wars between the Ottomans and the Safavids also shook Hani deeply. Some researchers have interpreted Hani's thoughts expressed in *Mem'u Zîn* about the Kurds, which have been deeply affected by years of wars, to reflect early nationalism. For this reason, the literary value of the work was pushed back into the background, which caused it to be interpreted purely by nationalism. We will also talk about how Ahmad-i Hani influenced modern Kurdish literature in this work. We will examine in what context Hani and *Mem û Zîn*, especially in the poems of modern Kurdish poets, are treated, how they are influenced by Hani's ideas and works.

Keywords: Ahmad-i Hani, Mem û Zîn, Poetry, Modern Kurdish Literature, Influence

1. DESTPÊK

Ehmedê Xanî, di dîroka edebiyata Kurdî de wek ‘‘pêşengê neteweperweriya Kurd’’ tê naskirin, yan jî hinek kes bi taybetî wî aliye wî derdixîne pêş. Em jî dixwazin li ser sedemên vê yekê bisekinin ka gelo tesîra Ehmedê Xanî li ser edebiyata Kurdî ya modern-nemaze li ser helbestkarê modern- çi ye? Gelo helbestkarê kurd yê modern di helbestên xwe de çawa Ehmedê Xanî bibîr tînin, li ser vê yekê jî em dê ji helbestên wan çend mînakên bidin.

2. EDEBİYATA KURDÎ YA MODERN

Ji bo ku em bişên tesîra E.Xanî li ser edebiyata Kurdî ya modern têbigihin divê em pêşiyê behsa destpêka edebiyata Kurdî ya modern bikin. Bi fikra me edebiyata Kurdî ya modern bi awayekî şênber bi kovara Hawar’ê dest pê dike.¹ Kovara Hawarê bingeha edebiyata Kurdî ya modern li ser sê

1 Erê rast e, di serê sedsala 20’an de li Stenbolê rojnameyên wek; Şark ve Kürdistan (1908), Kürd Teavûn ve Terakki Gazetesi (1908), Rojî Kurd (1913), Yekbûn (1913), Hetawî Kurd (1913) û kovara Jîn (1918)) hene lê cara ewil em di Hawar’ê de rastî cureyên edebiyata modern tînin. Binêre Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî, *Li Kurdistanê Bakur a li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981)*, (Uppsala:Jîna Nû Yayinlari, 1989), 16.

Divê em ji bîr nekin ku piyasa (şano) ewil ya Kurdî jî di kovara Jîn de çap bûye ku ew jî aliye Evdirrehîm Rehmî Hekkarî ve hatiye nivîsîn. Her wiha Mem û Zîn jî cara ewil weke kitêb li Stenbolê di sala 1919’an de ji aliye Kürt Tamim-i Maarif ve

2. ULUSLARARASI AHMED-İ HÂNÎ SEMPOZYUMU “İslam Düşüncesinde İnsan”

stûnan ava dike. Ew; çavkaniya edebiyata Kurdî ya Klasîk, folklor yan jî zargotina Kurdî û wergerên ji edebiyatên rojava û rojhilat. Di Hawarê de ligel helbestên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran..hwd çend beş ji Mem û Zîn'a Ehmedê Xanî de tên çapkirin² û danasîna şa'irên Kurd yên klasik tê kirin. Şa'ir yan jî nivîskarên Hawarê gelek caran Ehmedê Xanî bi bîr tînin. Wek mînak Celadet Bedirxan bi navê Herekol Azîzan di Hawarê de li ser Ehmedê Xanî wiha dinivîse³:

'...Mela Camî di heqê Mewlana Celaledînê Rûmî û kitêba wî 'Mesnewî' de gotiye:

Men çî gûyem wesfî an alîcenab

Nist pêxember welê dared kitab

Yanî ez di heqê wî alîcenabî de çî bibêjim, ne pêxember e, lê kitêba wî heye. Ev pesnekî bilind û hêja ye û bi her awayî li bejna Mewlana têt. Di heqê Ehmedê Xanî û kitêba wî 'Memozîn' de, bi min be, mirov dikare jê bêtir jî bibêje. Belê Xanî jî xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a milî, pêxemberê ola me ya nijadîn...'

3. TESÎRA EHMEDÊ XANÎ

Gelo ji ber çî her nivîskar yan jî helbestkarekî Kurd wexta dest bi nivîsê yan jî axaftinê dike pêşiyê navê Ehmedê Xanî bilêv dike? 4 Ji ber çî ew her car xwe ji bo Ehmedê Xanî deyndar dibînin? Bi ya me, bersiva vê pirsê taybetiyeke edebiyata Kurdî ya modern jî derdixe holê ku ew jî rengê neteweperwer ya edebiyata Kurdî ya modern nîşan dide. Her nivîskar yan jî helbestkareke Kurd ya/yê modern wexta Xanî bi bîr tîne jiber van rêzikên ji dibaceya Mem û Zîn'ê vedibêje:

*'...Da xelk nebêjin ku Ekrad
Bê meerifet in bê esil û binyad
Enwaî melet xudan kitêb in
Kurmanc tenê di bê hesêb in
Hem ehlê nezerê nebên ku kurmanc
Eşq nekirin bo xwe amanc...'*

Ji bo ku mijara me baştir bê fêmkirin em ê fikren Rênas Jiyan û Zülküf Ergün li ser têkiliya neteweperiya Xanî û tesîra vê yekê li ser edebiyata Kurdî ya modern parvebikin. Rênas Jiyan li ser

Neşriyat Cemiyeti ve hatiye çapkirin. Hemzeyê Muksî amadekariya vê çapê kiriye. Binêre: Ayhan Tek, *Hâmisiz Şâir Babasız Metin Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*, (İstanbul: Nûbihar Yayınları, 2018), 21.

² Beriya Hawar'ê bi rojnameya ewil ya Kurdî bi navê Kurdistan (1898, Qahîre) de ji bilî hejmara ewil û ya dûmahîkê di hemû hejmaran de cih dide helbestên ji Mem û Zîn'ê. Em dibînin ku êdî di rojnamegeriya Kurdî de hema gava dest bi weşaneke nû tê kirin di hejmara ewil de cih dide Xanî û Mem û Zîn'a wî.

³ Herekol Azîzan, "Klasîkên Me An Şahir û Edîbên me yên Kevin", *Hawar*, ed. Firat Cewerî (Stockholm: Nûdem Yayınları, 1998), 813.

⁴ Tesîra Xanî ne bi tenê li ser edebiyata Kurdî ya modern her wiha li ser hunera Kurdî çêbûye. Di huner û edebiyata Kurdî ya modern de Ehmedê Xanî wek kesekî dirokî û edebî cih girtiye. Wek mînak mirov dişê; romana Jan Dost ya bi navê Mîrname, çîroka Helîm Yûsiv Memê Bê Zîn, strana Nizamettin Ariç Hawar ya Ehmedê Xanî û filma Ümit Elçi ya bi navê Mem û Zîn nîşan bidet.

2. ULUSLARARASI AHMED-Î HÂNÎ SEMPOZYUMU “İslam Düşüncesinde İnsan”

neteweperwerî yan jî nasyonalîzma edebiyata kurdî dibêje ku di edebiyata Kurdî de şecereya nasyonalîzmê bi Ehmedê Xanî dest pê dike lewre ji ber faktora neteweperweriyê hemû edebiyata Kurdî di bin tesîra romantîzmê de dimîne.⁵ Zülküf Ergün jî derbarey tesîra neteweperweriya Ehmedê Xanî li ser helbesta Kurdî dibêje ku “*di serî de Hacî Qadirê Koyî hemû helbestvanên neteweperwer ên Kurd, Xanî wek pêşengê helbesta neteweyî*”⁶ qebûl dikin.

Nivîsandina bi Kurdî ji bo her nivîskar yan jî helbestkarekî/e Kurd armanca sereke ye. Lewma wexta ew dest bi nivîsandinê dikin difikirin ku 300 sal beriya wan Ehmedê Xanî jî wekî wan ji heman sedeman bi Kurdî nivîsiye. Mirov vê helwestê divêt ne wekî dijminahiyeke li hemberî zimanên gelen cîran binirxîne. Ger wiha bûya Xanî mulemme’ya (helbestên ku bi du yan jî zêdetir zimanan hatine nivîsandin) ku bi Erebi, Farsi, Tirkî û Kurdiya Kurmancî nedinivîsand. Di lêkolîna xwe de me dît ku wêjekarên Kurd helwesta E. Xanî ya li ser nivîsandina bi Kurdî wiha şîrove dikin. Li gor wan Ehmedê Xanî jî dikarîbû bi Farsi, Erebi yan jî Tirkî binivîsanda lê wî bi taybetî Kurdî berhemên xwe nivîsandin. Di bîranîn yan jî hevpeyvînên xwe de edebiyatvanên Kurd yê modern di sedemê nivîsandina xwe de vê helwesta Ehmedê Xanî wekî referans qebûl dikin û dixwazin bêjin ku “vaye hûn dibînin, em bi kurdî dinivîsin, zimanekî bi navê Kurdî û milletek bi navê Kurd” heye. Wek li jor jî me diyar kir edebiyatvanên Kurd belku ji dewlemendiya asta berhemên Ehmedê Xanî zêdetir di bin tesîra fikren wî yê li ser neteweperweriyê de mane yan jî ew bi tene dixwazin vî aliye wî bi bîr bînin û li gorî ideolojiyên xwe wisa şîrove bikin. Edebiyatvanên Kurd yê modern zêdetir fikren E. Xanî yê li ser bêtifaqî, bindestî, parçebûn, belengazî û nezaniya Kurdan bo xwe referans digirin. Remezan Alan li ser vê helwestê, gotina Susan Sontag’ê bi bîr tîne. S. Sontag dibêje ku “*şîrovekar ji ber daxwazên ‘modern’ serî li metnên kevin dixist û wan metnan ji bo îhtiyacên îroyîn diemiland*”⁷

Di helbesta Kurdî ya modern de jî em heman helwestê dibînin ku helbestkarê Kurd yê modern jî Ehmedê Xanî wekî pêşengekê bo xwe qebûl dikin. Ew di helbestên xwe de gelek caran E. Xanî, lehengên berhema wî ya Mem û Zîn’ê di çarçoveya evîn û neteweperweriyê de bi bîr tînin. Em dikarin çend mînakên ji helbestên wan vê yekê nîşan bidin.

Osman Sebrî di helbesta xwe ya bi navê “Evîn” de behsa girtina xwe dike. Wî li Suriyê jîyan dikir. Di wê dewrê de jî Suriye di bin hukmê Frensiyan de bû. Osman Sebrî tê girtin û wî sirgûnî girtigeha girava Sainte Maria’yê (Sent Mariye) dikin. Li ser vê yekê Osman Sebrî wiha dibêje⁸:

“...Ew rewşa şeng û oflaz

5 Rênas Jîyan, “Di Wêjeya Kurdî de Nasyonalîzm”, *Ji Şevê Re Çend Têgehên Dera Hanê*, İstanbul: Belkî Yayınları, 2008, 40-143.

6 Zülküf Ergün, *Nerî û Helbest Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)*, (İstanbul: Nûbihar Yayınları, 2007), 14.

7 Binêre: Remezan Alan, “Di Nav Lepê Şîroveyan de Mesnewiyeke Mîstîk”, *Bendname Li Ser Rûhê Edebiyatekê*, İstanbul: Avesta Yayınları, 2008, 20.

8 Osman Sebrî, “Evîn”, *Dîwana Osman Sebrî*, İstanbul: Pêrî Yayınları, 2004, 64.

2. ULUSLARARASI AHMED-İ HÂNÎ SEMPOZYUMU “İslam Düşüncesinde İnsan”

*Çavmat dihêle Xanî
Heke Feqî bidîta
Dê dest li ber bibesta
Melê bi sed kul û derd
Wê leva xwe bigesta
Ew jî ji bo me pîr dît
Felekê, kir neyarî
Rahişt mile me avêt
Nav girava Sent-Marî...’’*

Evdila Peşêw di kitêba xwe ya bi navê *Birakuji* de di behsa şerê di navbera partiyên kurdan dike û wiha dibêje. Gazindan ji Kurdan dike, Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî bi bîr tîne9:

*‘...Rûwê we reş be
Peyvên nav ferhengê jî we beş kir
Xanî û Hacî Qadir jî we beş kir
Ax û av û agir jî we beş kir
Ka we çî hişt
Ka we kî hişt...’’*

Di helbesta xwe ya bi navê “Em Azadîxwaz in” de Cegerxwîn daxwaza jiyaneke azad dike û dibêje divêt em ne wekî Mem û Zîn bijîn10:

*‘...Mirovperest im rengê Cegerxwîn
Serbest bijîn tev, ne wek Mem û Zîn
Jîna serbestî, divê me ev jîn
De rabe ser xwe kurê mi rabe!..’’*

Arjen Arî di helbesta xwe ya evînî ya bi navê “Nûra Nûranî” de him çîroka Şêxê Sen’anî him jî E. Xanî bi bîr tîne11:

*‘...nûrek ji nura nûranî
tîjkên roja asîmanî
ji bedewiya yezdanî
hat û perda dil hilanî
got, ‘sairo bêdilmanî
ez ew keçika file me
ne tu bî Şêxê Sen’anî?’*

9 Evdilla Peşêw, “Dijberî”, *Birakuji*, Trc. Rûken Bağdu Keskin-Bedran Hebîb (İstanbul: Avesta Yayınları, 1996), 17.

Yazar Adı Soyadı, *Kitap Adı*, trc. Çeviren Adı Soyadı (Baskı Yeri: Yayıncı, Baskı Tarihi), Sayfa Numarası.

10 Cegerxwîn, “Em Azadîxwaz in”, *Hêvî*, İstanbul: Avesta Yayınları, 2003, 45.

11 Arjen Arî, “Nûra Nûranî”, *Şi’ir û Sînör*, İstanbul: Evrensel Basım Yayım, 2013, 55.

2. ULUSLARARASI AHMED-İ HÂNÎ SEMPOZYUMU “İslam Düşüncesinde İnsan”

*min got, ‘haşa, mirîdek im
dil feramoş, derwêşek im
di êşa eşqê d’êşkêşek im
nakim qesîdeyek Xanî...’*

Di mînakên di helbestên li jor jî tê dîtin şa’irên Kurd, di babetên wek; bindestî, bêtifaqî, şerê navxweyî û evîniyê de Ehmedê Xanî bi bîr tînin. Ev yek wek di destpêkê de jî me diyar kir ji bersiva pirsra ka gelo wateya Ehmedê Xanî ji bo şa’irên Kurd çi ye, dide.

4. ENCAM

Ehmedê Xanî bi berhêm xwe di sedsala 17’an de di edebiyata Kurdî de qonaxeke nû dide destpêkirin û ji bo yên li dû wî tînin dibe şevçirayek. Her şa’ir yan jî nivîskareke Kurd yê modern di bin tesîra Ehmedê Xanî û fikren wî de maye. Edebiyatvanên Kurd yên modern ji ber îhtiyacên îroyîn yên civaka Kurd, dewlemendiya berhemên Ehmedê Xanî nabînin belku jî bi tenê Xanî wek pêşengê neteweperweriya Kurd dibînin. Ger şert û mercên civaka Kurd biguhere dibe ku helwesta edebiyatvanên Kurd jî biguhere. Ew Ehmedê Xanî û berhemên wî-bi taybet Mem û Zîn’a wî- ne wek manîfestoyeke neteweperweriyê binirxînin, asta bilind û edebî yên berhemên wî bibînin. Ne bi tenê ideolojiyên xwe lê bi pîvanên edebî jî vê yekê pêk bînin.

ÇAVKANÎ

Alan, Remezan. *Bendname Li Ser Rûhê Edebiyatekê*. İstanbul: Avesta Yayınları, 2008.

Arî, Arjen. “Nûra Nûranî”. *Şi’ir û Sînor*. İstanbul: Evrensel Basım Yayım, 2013.

Azîzan, Herekol. “Klasîkên Me An Şahir û Edîbên me yên Kevin”. *Hawar*. Ed. Firat Cewerî. 810-818. Stockholm: Nûdem Yayınları, 1998.

Cegerxwîn. “Em Azadîxwaz in”. *Hêvî*. İstanbul: Avesta Yayınları, 2003.

Ergün, Zülküf . *Nerî û Helbest Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)*. İstanbul: Nûbihar Yayınları, 2007.

Jiyan, Rênas. “Di Wêjeya Kurdî de Nasyonalîzm”. *Ji Şevê Re Çend Têgehên Dera Hanê*. İstanbul: Belkî Yayınları, 2008.

Lewendî, Mahmûd û Malmîsanij. *Li Kurdîstana Bakur a li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981)*. Uppsala: Jîna Nû Yayınları, 1989.

Peşew, Evdilla. *Birakujî*. Trc. Rûken Bağdu Keskin-Bedran Hebîb. İstanbul: Avesta Yayınları, 1996.

Sebrî, Osman. *Dîwana Osman Sebrî*, İstanbul: Pêrî Yayınları, 2004.

Tek, Ayhan. *Hâmisiz Şâir Babasız Metin Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*. İstanbul: Nûbihar Yayınları, 2018.